

HEJMAR
10

%100
KURDÎ

pîne



ma em mecbûr in tişteki bêjin!

KOVARA QERFÎ Û WÊJYÎ



kovara qerfî û wêjeyî ji panzdeh rojan carekê derdikeve 16-29 şubat (reşemî) 2000 Sayı: 10 500.000 TL

Her kes qala çekên wenda dike, lê di serî de serokomarê Tirkîyeyê S. Demirel, hemû rayedar, tevî nîşaneyên berbiçav, dewletê ji her tiştî dişon!.. Lê wekî ku rojnamegerê tirk İsmet Berkan dibêje "ku dewlet mirovan nakuje, ma çima ji İsrailê 'têlên xeniqandinê' dikire?"



QEY
WE DIGOT
TIŞTEKÎ
DINE?..

Pîneka pîneyê

MAZLÛM DOĞAN ■ ■ ■

SERDEMA NÛ

Her çend di racona TRT de jî hebe, divê mirov carina li ser hin rojan axaftina ku girîngiya rojê dide zanîn (günün anlam ve önemini belirten konuşma) bike (ağubet ne li serê kesî be!). Belê, Pîne bi teq û reqî û tewşo mewşo gihişt hejmarê dehan: Oxira me ya xêrê ye û Xizir jî bi me re ye! Prêzeya me ya deh hejmaran îrade dike (te go çil)!

Ev çax û serdem ji bo zimanê kurdî, li bakurê welêt, dem û qonaxêke dîrokî ye. Di warê çand û zimanê kurdî de tevger û hereketeke nû hêdî hêdî

radibe. Em, vê yekê, hem bi çavê serê xwe dibînin û hem jî pêjna wê hiltînin. Ji xwendevanan gelek nameyên sererast û lihevhatî digihêjin ber destê me.

Ger kurd di vê çax û qonaxê de rola xwe pêk bînin, dê di warê çand û zimên de bi ser bikevin. Ji ber vê hindê, divê mirov 15 Reş-emiye, ku ji bo piraniya kurdan rojê reş û kambax e, li ser vê bingehe fêm bike. Heke tu dixwazî vê komployê di avê bibî, di nava mala xwe de "odeyêke" veke, hînî zimanê xwe bibe û hînî

kesine din bike. Bi hêstirbarandin û liberketinê tu tişt naçe serî; kes li kesî avê venaxwe, lewre hemû dewlet ketine taya germkirina bêrika xwe! Dilê kesî bi bindestî û hejariya kurdan naşewite!


Ji ber vê çendê 15 Reşemiye divê mirov bi zanîn, wêje û hunerê bi bîr bîne zimên. Filmên baş, roman, çîrok û helbestên tîmaverok, bi kurdî rojnameyêke rojane, wê ziravê serdestan biqetîne. Lewma dema ku zimanê te biguhere, wê kesayetiya (şexsiyet) te jî biguhere. Ev jî serkeftin bi xwe ye. Ji ber vê hindê divê mirov 15 Reşemiye wisa bi bîr

bîne: An ziman an neman!


Berî ku ez dest bi nivîsandinê bikim, midûrê me birêz Seyit Karabaş dîsa hat û got, "emê kovare bişînin çapxaneyê, divê tu deh deqîqeyan de nivîsa xwe binivîsî". Di ber jî got, "zû ferhengokê xelas bike, divê em bişînin çapê." (hûn a rast bixwazin, me ferhengok xelas kir. Çavê me bar nebû, me got em berfirehtir bikin. Lê di vê navê de qezayekî komputûrel qewimî û ferhengoka me bû mêvanê sergoya komputûrê. Lê piştî du-sê hejmaran wê ferhengok li ber destê we be.). Em rebenê

xwedê bi şev û roj dixebitin, na roja wê zêde bû, dîsa jî qîma patrahan pê nayê! Em çî bikin, hûn jî bi hawara me de nayên! Ew xwendevanên ku li Amedê Pîne standine, lê pereyê wê nadin, pereyê xwe bişînin, da ku em pê xwarineke xweş bixwin! Bi hêk û penîrê spî xwarindanka me (yanî mide) bû meşka qulqulî. Her tim li Pîneyê hinekê diqîrin, "kuro, zû derkeve! ma bû werfîs!"



Ger hûn pereyê xwe neşînin wê çek-senet mafyasî (li vê derê çek bi kurdî ye) were serdana wê! (hûn bi xwedê dikin, nedin! bila dîn û har bin. heyfa me jî hilînin, ji xwe nadin me.)



FISGUR



(*) BÊ MANE



DEMIREL LI WANÊ ZIRT LI GELÊ AŞTÎ XWEST, KIR û got: "Em nikarin bi kesên ku zarokê pêçekê û kal pîran dikujin re li hev werin."



Tirkiye ji ber hikûmeta faşist a Awistiryayê aciziya xwe diyar kir: "Guriyo, navê min li te, kumê min li serê te."



WALIYÊ ENQEREYÊ JI KOMARA DÎNAN ACIZ BÛ



Te go çî?

"Dewlet dikare carina ji adetê derkeve"


S. Demirel

WÊ LI TIRKIYÊ LI SER CINSIYETIYÊ DERS BÊNE DAYIN







Ç R K N

KRAL



DURÛ TIYA HIN ROJ-NAME YÊN KU XWE WEKÎ ÎSLAMÎ BINAV DIKIN, DIDE NAVÊ





Kirinolojiya Me

Hefim Yûsiv, an Jan Dost bû, baş nayê bîra min, li NÇM'ê di guftûgoyekê de (bi rastî ez nizanîm ev peyv çi ye) ev gotin got:

"Kurd hevdu rexne nakin, nizanin hevdu rexne bikin; dema ku dikin, hevdu dikujin!"

Ku hûn aciz nebin û destûra we hebe, ez jî dixwazim rojnâmeya Şaşnêrîn (Pardonk! Özgür Bakış) û Enstîtûya Kurdî bikujim!..

Di vê nivîsê de pêkenîn, lêkenîn tune (Ku hun bibêjin, di kîjan nivîsa te de heye, ne xem e. Êcap dike em birayê hev in!), ev nivîseke cidî ye. Kî bikene mala wî ne aval Bi Xwedê vêga hate hişê min ku hetanî îro jî min bi xwe tu kurdekî malava nedîtiye; li vê dinyaya rûreş kî ji sedî pêncî jî kurd be, malmîratî jê re qeder e.

Me dîsa mijar belav kir.

Wekî hûn jî dizanin, Rojnâmeya Özgür Bakışê bi kûponan li xwendevanên xwe 'diyarîya' mîlînyûmê belav kir. Na, belav nekir, tenê niyet kir, ji ber ku DGM'ê ew albûm qedexe kir. Belavkirin nebû nesîb. Çi bû ew diyarî? Kronolojîk Albûma Kurdan. Ji 1900'an heta 2000'an.

Her çi qas li ser berga albûmê "Ji 1900'an heta 2000'an" nivîsandibin jî, kitêb bi xwe bi beşa "Ji 1000'an heta 1900'an" dest pê dike û di pênc rûpelan de DEH dewletên kurdan hildiweşîne:

- Dewleta Merwanîyan hilweşiya.
- Dewleta Büveyhoğullan hilweşiya.
- Dewleta Hemdanî hilweşiya.
- Ziyara Alamûtê ji holê hate rakirin.
- Dewleta Şeddadiyan hilweşiya.
- Xanedana Eyûbiyan parçe bû.
- Dewleta Hasanveyh belav bû.
- Dawîya Dewleta Alamûtê.
- Dewleta Goran hilweşiya.
- Dewleta Fedlaviyan hilweşiya...

Bi tenê bi hilweşandina dewletan têr nebûne, çi qas sazî û şexsiyetên kurdan ên dîrokî hene yek bi yek di binê van semqvan de kuştine:

Hilweşiya!.. Perçiqî!.. Ji hev ket!.. Pelîş!.. Parçe bû!.. Mir!.. Hate kuştin!.. Wêran bû!.. Mîrat bû!.. Kevir li ser kêvir nema!.. Xatir xwest!.. Derbas bû!.. Têk çû!..

Zaro Axa jî, di nava wan şexsiyetan de, di binê sernavê "Mir" de kuştine. Ew Zaro Axa ku (pa çi zaro çi zaro!) bi temenê xwe yê dirêj (157 sal) di Pirtûka Rekorên Dinyayê Gînesê de ji xwe re malîkek ava kirîye.

Xwedê ji we razî, qey we bigota Zaro Axa di maratona jîyanê de bû xwedî rekor, wê koremarek bi zimanê we ve veda?!..

Dema ku mirov rûpelên albûmê vedike, psîkolojiya mirov jî 'hildiweşe', 'parçe dibe', 'dimire', 'mîrat dibe' bi Xwedê!

Ev kronolojiya kurdan e, yan kirinalojiya wan e, min bi xwe fêm nekir.

Mebest çi ye?

Dîroka kurdan bi şewat e!..




Herre ku tu neçî!..

Çima tirk bi avakirina çardeh dewletan pesnê xwe didin? Ya ji bêaqilî ya jî ew çardeh dewletên wan hê jî ava ne!..

Ma avabûna wan dewletan ku we hilweşandin û bûyîna wan şexsiyetên ku we yek bi yek kuştin tune?..

Jixwe psîkolojiya me ne zêde sexî ye heyran. Hûn ji me çi dixwazin?! Dawa îmana me dikin?!..

Xwedê ji DGM'ê razî be ku ev albûm berhev kir! (Bê henek ha...)



TAQ

Pirtûk

- Ramûsana Min Weşartin li Geliyekî Arjen Arî Avesta
- Sirûda Baranê (wergêr Jan Dost) Bedir Şakîr El-Seyyab Avesta

Avesta

- Keçika Qirşiroş M. Emin Bozarşan Deng
- Mîr Zoro M. Emin Bozarşan Weşanên Deng

*

- Teyrê Baz ya da Hüseyin Baybaşın Mahmud Baksi Pêrf
- Demokratik Mücadele ve Gençlik Zeki Akıl Zelal
- Kayıp Dîwan Muhsin Kızılkaya İletişim
- Zîne'nin Sevdası Latif Kaya Mazlum
- Cizira Botanlı Bedirhaniler Malmisanij Avesta
- Kürtler Dawid McDowall Avesta

Kovar:

- Jiyana Rewşen hej. 37
- Kurmancî cilda yekemîn Apec (Swêd) (Kurmancî weşana Enstîtuya Kurdî ya li Parîsê ye, ji sala 1987'an vir ve tê weşandin. Kovar ji bo sazkirina zaravaya kurmancî û danîna termînolojîya wê kar dike.)
- Vate zivistan hej. 10
- İslami Bakış hej. 2

Kaset-CD:

- Kamkars Gulnîşan Yeni Dünya Müzik (Kamkar di warê navneteweyî navdartinê koma muzîka kurdî ye. Kom ji rojhilatê welêt e û bi kurdî (soranî, hewramanî) û farisî muzîkê durist dike. Kamkarê bingehe muzîka xwe li ser muzîka resen û gelêrî ya kurdî daniye.



LO BETALO!

→ kaxiza / kametgahê
→ 2 heb fotograf
4. ÇIÇEK

U TU MEMLEKETAN, BI QASÎ ME QEWHEXANE NÎN IN. HÛN JÎ PÊ ZANIN QEWHE, BI XWE, ÇIHE BETALAN W.


XWEZÎ MIN ÎS NEDABA WÎ... ZÊDE KEPAWÎ HAT

OOY NAZE NAZYA MEKE

QET JI PSÛKOLOJÛYA QEWHE FEHM NAKE JI BO ÇI LI VIR IN? DERDE WAN ÇI YE?!



PEYWA 'BEKAR' JI PEYWA 'BÊ KAR' QÊBÛYE.. YANÎ WEXTA KU KARÊ TE NÎN BE KES QÎZA XWE NADE TE...



BETALIYA ZÊDE DIBE SEDEMA NEXWEŞIYÊN PSÛKOLOJÛK JÎ



BELÊ! WEKÎ KU XALTIYÊ JÎ U JOR GOT "HEKE PEREYÊN MIROV HEBIN, KAR PEYDAKIRIN NE XEM E.



JI HINEK ALIYAN VE TÊ XWESTIN KU BETAÛ WEKÎ SEDEMA ÇÛYINA ÇI YÊ BÊ NÎSAN DAN... HEVALÊN KU TEVLÎ GERÎLA DIGÛN JI BER VÎ YEKÊ DIEŞIYAN... LÊ HINEKAN JÎ L'HEMBER VAN GOTINAN TEDBÎREN XWE DIGIRTIN...



LÊ JI BO BETALÊN AMEDÊ NE XEM E.. ÇIMKÎ "QOZA HERÎ DAWÎN YA ZAROKÊN BAJÊR, YAN WÊ BIBIN QEWHEÇI, YAN JÎ ÇIÇERCÎ."





Serkomsêr Dawo

Çendek maqûlên ji navçeya me, yên li Stenbolê bi cî bûbûn, hatin dermanxaneya min, ya ku nû dest bi kar kiribû. Tu nabêjî taxa ku ez lê bi cî bûbûm, di destê nijadperestan de ye. Mêvanên min xwestibûn min bi serkomsêrê taxê bidin naskirin. Halê dinyayê bû, belkî rojekê karê min biketa ber destê wî. Navê serkomsêr "Dawo" bû û ew hemwelatîyê me bû. Min dil tunebû bi polêsekî re dostaniyê daynim. Bi israra mêvanan min serdana Dawo qebûl kir.

Dawo, li gundekî navçeya me, sê salan dibistana seretayî xwendibû û bi gotina wî, şadnameya (şehadetname-dîplome) sêsale wergirtibû.

Paşê dest bi şivantî û gavantiya pez û dewarê bavê xwe kiribû. Bavê wî dizekî navdar ê pêz bû. Roj bi roj keriyê pezê wî mezintir bûbû. Azmûna (imtihan) polêsiyê pêk tê. Dawo bi bertîlan şadnameyêke pênc-

sale bi dest dixê û dibe polês. Dawo, paşê dibe komsêr û serkomsêr.

Jiyê Dawo nêzîkî şêst salan bû. Her şev li gazîno û pewyonan belaş dixwar û vedixwar, serxweş di hate malê. Belê, Dawo ji nimêj û rojiya xwe jî nedima. Qama wî kurt, porê wî weşiyayî bû, zikê wî mîna têreke arvên bû. Pantorê wî nedigihîşt ser zikê wî. Qayîşa pantor li ser berzikê girêdida. Kujê dawa kurtikê wî, her tim li derveyê pantor bû. Sola wî bê boyax, diranên wî zingarî, bêhna genî ya xwendanê jê dihat.

Danê sibehê em çûbûn komsêrxaneyê. Ew jî nû hatibû. Ji me re çay xwest. Wî malbata min nas dikir û navê min jî bihîstibû. Dest bi şîretan kir, ji "solçîtiyê" û "kurdçîtiyê" tiştêk dernediket. Wî bi qasî min xwendibûya, kes pê nizane ewê çî qas bilind û dewlemend bibûya. Ez ji malbateke xwende û xwiya bûm. Wî fêhm nedikir malbatek wiha bi aqil, çima ew qasî kêmaqilî dikir. Li gorî wî, Xwedê xwarin dida kesên bê diran.

Dawo, ji polêsê li ber destê xwe rapora rojê xwest. Sê kesên berdûş ên pêxwas, xwestibûn camêrekî efendî yê dewlemend bişêlînin, tazî bikin. Polêsan ew girtibûn û avêtibûn nezaretxaneyê, lê dewlemend ji bo giliyê li derve rûniştibû, li benda serkomsêr bû. Dawo jî pirsî:

-Hûn li ser wan geriyên?

-Erê.

-Çi derket?

-Li ser pêxwasan ne tu tişt. Li ser ê dewlemend ê gilîker jî destyek dolar. (Peryên biyanî qedexe bûn.)

-Pêxwasan berdin, gilîker bixin nezaretxaneyê!


-Serseran serkomsêrê min!

Dawo vegeyîya ser me. "Tu nan ji

pêxwasan demakeve. Divê yê dewlemend di nezaretxaneyê de be, ku em destyê dolaran mîna du bira li hevdu par bikin". Wî jîrikî û bîaqiliya xwe nîşanî me dabû.

Min ode terikand. Dawo li dû min bang kir, "Çi karê te hebe, were ba min ha! Lêbelê, bila ne siyasî be!.."

Ez lê venegeriyam û bê xatirxwestin min xwe avête derve.



QIJÊ Û VINNO-2 Û NÎVEŞEVBAŞ

Saet niha 23 û nîv e. Nîv saeta din wê bibe nîvê şevê. Û ez li ber computerê xwe rûniştîme, da ku nivîsa quncika xwe biquncînim. Lê, nabe! Ez dikim nakim nabe! Dewama çîroka ku min di hejmara berê de nivîsibû û gotibû "dê bidome" nadome. Min belkî 10-15 rûpel avêtin çopa computerê. Cixarê li dû cixarê dikşînim, dîsa nabe. Min qehweyek teze çêkir, da ku piçekî hişê min vebe, dîsa nebû.

Ez rabûm min televîzyon vekir, dibe ku bi xêra televîzyonê çîrûskê di mêjîyê min de biçîrûske, lê dîsa nebû. Tam di wê wextê de ji buroya Pîneyê, Mazlûm telefonî min kir. Hal û ehwalê min pirsî "gelo ez çawa me, ez baş im?" Xwedê jê razîbiyo! Ma 12'ê nîvê

şevê qet hatiye dîtin û bihîstin ku meriv halê hevûdu bipirse? Neyse, me piçekî behsa dunyayê kir; ji dunyayê jî em berbi rewşa Pîneyê ve hatin. Gelo Pîne çawa ye, kîjan quncik baş e, kîjan xet û xêz baş in! Belav dibe, pir tê xwendin, xelk jê hez dike û hwd. Û di wir re jî em hatin ser rewşa biderengîketina nivîs û karîkaturan. Û ser quncika min! Divê ku heta serê sibê ez nivîsa xwe amade bikim û bişînim!

Yarebî ez çî binivîsim? Nizanim! Mêjîyê min jî mîna dunyayê û rewşa kurdan welê tevîhev bûye ku carna meriv nikare ji navê derkeve!

Lê ezê ji we re piço piço binivîsim. Êdî we çî jê fam kir!

Rewşa kurdan a niha wek meşa li ser **Pira Seratê** ye. Hûn dizanin Pira Seratê ger emelê merivan baş be, dibe wekî rîyeke fireh, ger xerab be, dibe wekî mû. Îcar gava ku em li rewşê dinêrin, wekî mû ye. De were di ser mû re bimeşe.

Kurdistanê Başûr hem dewlet e, hem ne dewlet e. Hem dikare bibe dewlet, hem jî dikare bibe ne-dewlet. Hem dikare bimîne hem jî dikare belav bibe! Ew jî pêşî di destê hêza kurdan, piştê Amerîka, piştê

Seddâm de ye. Ka em binêrin û bipên, hela wê dewletek li Yekîtiya Dewletan zêde be, an na wê milletek ji navê rabe!

**

Kurdistanê Bakur jî li ser pira maş û nemanê ye. Hêzên kurdan dev ji gelek tiştên xwe berdan. Berê te li program an jî daxwaza kîjan partiyê dinihêrt, ji serxwebûnê niçikekê jî danediket. Lê daxwaz û programê wan jî berê gelekî cihê ne.

**

Kî devê xwe vedike, hema dibêje "çima kurd nabin yek!"

Kurd bûne yek, heta ji berê de yek in. Ji dewra Medan û vir de her yek in.

Baş e! Pirs û girêk di ku de ye yan jî çewtî di ku de ye? Çewtî di rêxistin (partî, komele, dezgeh û hwd.) û gotîna yekîtiyê bi xwe de ye. Ji ber ku herdu jî çewt hatine fêmkirin. Em partîyan ava dikin, program û destûran jê re çêdikin, lê tu hew dinihêrt ku partî dikeve bin tesîra dîsîplîneke eskerî an jî ne-demokratîk û demokratîkbûna xwe ji dest dide.

Partî, rêxistin, komele, dezgeh û ronakbîr û siyasîmedarên kurdan ne mecbûr in bi yek bin, yanê yekîtiya wan ne lazim e, lê bihevrekarkirina

wan lazim û pêwîst û acil e!

**

Nizanim li kîjan herêma Kurdistanê, dîsa, ji bo namûsê du malbatan repandine hev; ji herdu alîyan jî term û laş û birîndar bi erdê ve rast bûne.

Tiştê ku bi serê namûsê de hatiye bila bi serê kesî de neyê. Feqîra namûsê girtine kirine navbera du nigan û tep û rep e, li ser şer dikin.

Namûsa ku navê wê ziman e, ji dest diçe, namûsa ku navê wê tarîx, folklor, adet û stran û welat e, ji dest diçe, ew hê li dû namûsa di nav şeşê de ne.

Gelî xwendevanên birêz û ezîz û delal û xweşik û gulover!


Ez îro pir aciz bûme. Canê min sixilmîş dibe.

Ez nizanim çî yî dunyayê çî bikim. Dunyayeke welê ye ku her tişt bi reklam û anonsên hîç û pûç û derewan li ser piya ye. Hinek çîkê xwe bi paçîka mezin dikin û dikevin meydana çîkgîr û çîktûjan.




Hinek jî ne ji hevsarê sor dibin û ne jî ji hop hopê dikevin.

Ji xwe beleheq negotîne kerê pîr û hevsarê sor!

HESOXEV



FAKULTEYA PERWERDEHIYÊ



Xêzen Beredavî

camerfiraxsho@hotmail.com



CEMÎL DENLÎ

Em Nêr Dibin Tara Bêjîngê

Zayenda mê, ya kêmrûmet e, loma her kes jê direve. Ez dibêjim qey Tevgera Kurd li bakur, rizgarkirina jinê di ser her tiştî re girt.

Derxist pêş, mîna gelek tiştên din, ew jî nebû. Pir hêdî meşiya. Ji ber ku rehên vê rewşê, xwe bi hezar salan berdîdan binê koka dîrokê. Tenê hin rehên biçûk hatin birîn.

Şerê çekdarî hinekî sist bû, mêr got, "fersend, ev fersend e" û rehên ku hatibûn birîn dîsa av da û hêşîn kir. Li welêt, ev sê-çar sal e mirov xweziya xwe bi rewşa bîst sal berê tîne. Dibe ku mirov bibêje, mafê mêr heye rewşa xwe ya berê biparêze, ji her ku axatiya wî ji dêst çûbû çend salan... Lê jin!..


Çi li gund, çi li bajêr, jinê jî xelasiya xwe, di terkirina jinbûnê de dît. Ji jinbûna xwe reviya, mîna "cinê ku ji hêsin bireve". Carina mirov bi destê hevaleke jin digire, tê ku wê şevê ji ber êşa milê xwe ranekeve, ji ber ku bi hişkî dihejîne. Hin jê jî radihêjin tizbiyê. Em dibêjin, Xwedeyo, wê kingê ew roj bê ku mêr terka wê bike.

Li bajarekî Kurdistanê, ku navenda wî ji 218.000 mirovan pêk tê, ez pêrgî hevalekê hatim û me xwest ku em li ser lingan nemînin û çayekê vexwin.

Lê, wê stûyê xwe xwar kir û got ku mix-abin ciyekî wisa tune. Gifî û gazî kirin. Ez şaş mam. A li wî bajarî rûdinişt, ew bû û hêvî dikir ku rojekê mêr li sêdeqa serê miriyên xwe ciyekî bide wan jî, da ku bikaribin lê rûnên.

Du tişt, li ber çavan bûn. Yek, tu niyeta mêr tunebû ku dev ji komara xwe ya nêr û dût-demokratîk berde. A duduyan, tu niyeta jinê jî tunebû ku kevirekî biavêje şibakeyêke vê komarê û bidestxistina piçekî maf bigeriya û li her ciyê ku parçeyek ji komara mêran bû, ji ber dûtê cixareyê, ji bo ku mirov bikaribe maseya li pişt xwe bidîta, diviyabû daqûl bihata. Li ser her maseyê, mirovên reş; rî, simbêl û diran ji dûtê cixareyê zerbûyî, bi okey, pinîkêr, yan bi tiştêkî din dilîzin û li pişt her listikvanî jî du kesên din, stûyên xwe di ser milên wî re dirêj kirî, rûdinên. Boçikên cixareyan û toz û dûmanê li erdê wî ciyî warek ava kiriye ji xwe re. Û van kesan gişkan zanîngêh qedandiyê... Û jin, mîna mirîşka gêj, li dora rewşa xwe ya kambax dihulime. Girê xwe diavêje hundir û gava ku fersendê dibîne, dinyayê li serê xwe û li yê mêr dike dojeh... Ev jî heyfhişanîna wê ye.

Vê rewşê, mîna kûrmê Eyûbî, xwe avêtiye nava zimên jî. Kurdên kuçeyan dipîvin, dengbêj û stranbêj in, bi xwe re nabînin hîni zimanê xwe bibin. Nivîskar û hin pêşkêşvanên televizyonê, wek ku zayenda peyvên mê di Kurmançî de tunebe, zâyenda nêr dubare, çarbare û hezarbarê dikin. Û kesek ji wan re nabêje, "lo, lo!" jî. Ku bi vî hawî here, emê bibin "yekem neteweya nêr" a milênûma sisiyan. Ji bo wê yekê, ola me, adetên me, jin û rêxistinên me jî musaft in.



*Bilim **Deney, Ceribandin

ZILITO

rewşa wî rewşa kerê nêr e

Comé

camerfiraxsho@hotmail.com



LOZIN



Haydar IŞIK

HİTLERÊ AVUSTURYA

"RAMAN E, RONÎ YE"




LI WANÊ, KOLANA CUMHURİYETÊ, WEKÎ KOLANA İSTİKLALÊ YA LI STENBOLÊ, BO TRAFİKÊ HATE GIRTIN.



Gitar

| | | | |
|--|---|---|--|
| Ji bo wan rojên ku em ketine taya wan... bi evîn û rêzan... | Mîna mûristangeke bi perî Tu çûyî Ji Diyarbekirê ber bi Waneke din... | Dibe ku li rawestgeheke trêne Her diçe... | Û bi tenê. |
| -Tu firî.. firî mîna gêrikekî bi bask Çûyî û hema wisa.. qet.. Ji nakokiyekê ber bi nakokiyên ve... Tu çîroka tu kesî yî! | Te digot qey wê Amed tu tiştî nebêje Tu çûyî di bin guhanên ewran de | lêger, wenda jankar Tu firî mûristanga min a bi bask Heya ku tu firî firî wêneyek niftîkek pênûsek bajarek, ji bîst û şeş ciyên xwe lêdan xwariye mir... dike bimire "berxa min" | Zimanê min lê nagere Dibe ku ez te nema bibînim Şev, şîf, kolanên vî bajarî teng êvar Bî tena serê xwe kelogirî dibim. "Li min vege, bi Xwedê dikî." |
| - Evîna min, karxezala min Wexta negotîna tu tiştî yel Henga bêxewbûnê, wexta hişyarbûnê dema sirê!... | Birî! Ez cixareya me ya dawî bi tena serê xwe dikêşînim... Û bi tenê bi bîr tînim Bêhna xwe digirim Hevramûsîna me ya dawî Tenê Ji jiyânê ditirsim Û... | Ronahiyekê koxtê, xubarî û pîr Ji bîst û şeş ciyên min, min tawanbar dike Girnişînên te yên ku her diçe berze dibin | |



Hîtlêr Avusturya de amevî dinya. Eke însan fotografanê zimelxiravde niyadano, riyê bêşeref û qatîl de meymenet çîno, ti vanê qayê xerepêto. Ti vanê qayê hasa sima ra, riyê kûtikiyo. Ey kûtiki ra jî zaf hes kerdê, lewê dênêna ra kûtik xo. Ez bawer kena kûtik de eyra zêde karakter esto. Hîtlêr, 55 mîlyon însan qetil kerd. Hîtlêrî, raya endustî ra mîletê yahudî qetil kerd. Sarê Ewropa na qetîlam ra "Holocaust" vanê. Yanê veşnayin, adirkerden û qetîlam.

Nê rojan de tomê Hîtlêrî, Jörg Hider vejiyo, merik ke firsat vînenê, kalikê xo goyneno. Rejîmê faşîstan goyneno, mîletê ecnebîra, zêde jî tirk û kurdan rê dişmenîna keno. Nika partiya ey Avusturya de biya wayirê nîmeyê hukmatî. Ez o bawer kena, nezdi de, na nêweşîna perena Elmanya û cîrananê Jörg Haider.

Dewleta Îsrail elçiyê xo peyser berd. Dewletê Ewropayê jî wazenê ke Avusturya îzole bikerê. Eke siyasetkarê Ewropa de namûs bivo, peyê nê (na) qisenê xo de vindirê, ez van zaf rindo. La belê siyasetkarê Ewropa de vîjdan, moral û namûs pers meke. Înan de namûs, hondê fahişê çîno. Her çiyê înan tîcaret, rotine û qezenco.

Nika tenê zey kûtiko lawênê, la belê tenê (heveyê) ke wext verdra, lewê nanê Jörg Haider ra.

Însan gereke bizano, kamî no mordemek kerd girs, kamî ey ard iktidar? Wexto ke ey Holocaust inkar kerd, wexto ke ey dişmenîna karkeranê kurd û tirk kerd, kesî vengê xo nêvet. Nika jî urzene (werzenê) ra Haider, nişenê ro Haider vanê.

A bîne ki, Jörg Haider faşîsto. Partiya ey rasîstîna keno.

Polîtîka înan faşîsta. O çax gereke însan, naye ke lawênê înan pers bikero, kuro na hukumatê Tirkîye çî bi? Parlemantoya înan de 19 kîştoxî estê, benê mebûsî, benê wezîrî û wayirê îkîdarî. Şîma ci ra înan ra qiseyê nêvanê? Kenan Evren, Doğan Güreş û ê bînan honde mîletê kurd qetil kerd. Siyasetkarê Ewropa rejîmê tirk ra hes kerd, binê linganê înan de xaliyê sûr kerd ra, goynay û yardim dave. Behey bêvîjdanî, şîma qe reyê nêvake ke, rejîmê Tirkîye rasîst û faşîsto?

Mesela bîne ke dewleta Îsrail a. Ez o bawer kena iyê nika rind kenê, elçiyê xo Vîyana ra peyser oncenê. No jî sênîko. Gereke dewleta Îsrail dostanê xo, Amerîka, İngîlîstan û Fransa îqna bikero, ambargoye aborî, û turîzm verva Avusturya bivirazê. Çike; faşîst, faşîsto. Faşîst dişmenê insanetiyo. Vizêr Hîtlêr cutir ke mîletê yahudî qir kerd, meştî rejîmê Haider tirk û kurd qir keno.

Feqet îta zu (yek) paradoks esto. Wezîrê Îsrail, Avusturya ra elçiyê xo peyser oncenê, la belê eke sono Tirkîye, uza jî rejîmê rasîstê Tirkîye goyneno. Na siyaset gereke xelata. Faşîstanê Avusturya ra nefret kenê, la belê faşîstanê tirkîyan ra jî hes kenê. Na senê siyaset?

Yanê verg nêbeno vorek. Belkî Haider ewro besenêkeno, armanca xo heta pêniye bero. La belê Jörg Haider raya vergu, raya îktidarî, dima kokê yahudî ard. Qiseyê mayê kîmanciye esto: "Lûye tûkê xo vurnena, feqet xo nêvurnena".



Ey avê avê avê av
Ma tu bi eşq û muhbet?
Mewc û pêlan tavê belav
Bê sekne û bê rahat î...

Feqiyê Teyran

Salek bê Derwês çawa li me bihur?
Salek bê ziman, bê dil, bê mêjî çawa derbas bû li ba me?
Salek bê kilam, bê helbest û bê muhbet çawa hate nivîsandin li jiyana me?

Ez dibêim; min cesaret bikira, min dê laş bişewitanda. Min cesaret bikira, min dê ziman lal bikira, alfabe biqelastana. Min cesaret bikira, min dê dil biterikanda, mêjî ji serî biavêta.

Lo ma dilê mirov çawa bi mirov giran tê? Lo ma mêjiyê mirov çawa mirov nas nake? Lo ma laşê mirov çawa dev ji mirov berdide û diçe? Lo ma dilê mirov çawa mirov diterikîne?

Çend herf kêm çend zêde, salek bê Derwês li ba min wisa derbas bû. Salek bê Derwês ez neaxivîm. Min kilam negotin. Min ji tu kesî hez nekir. Min ne soz da xwe û ne soz da tu kesêkî din. Salek bê Derwês, dengê dayika'm bi min xerîb dihat. Bûkan pûşî ji ser û çavan navêtin.

Salek bê Derwês, min çi kir? Çi ji destê min dihat?

Tenê dizanim ku, saleke bê Derwês bi tenê keniyam. g dizanim ku, ken ji bo min girîneke veşartî bû. Min cesaret bikira, ez dê bi têra xwe ne veşartî bigiriyama.

Paşê helbestên Feqî bi hawara min de hatin. Helbestên Feqî ji bo min bûn stargeh. Min ew li xwe pêçandin. Min xwe di nava wan de veşart. Ji ber berf û bahozan. Ji ber bîl-cumle însanan. Min got, bila teyrên Feqî bibine ziman ji min re; min got, bila ew bibin dil; min got, bila ew bibin nûr ji çavan re.

Bibûma wek teyrêkî Feqî, min ê jî çend tişt bigotana ji avê re, ji eşqa avê re, ji xwişexwişa wê re, di nava wê xwişexwişa wê de ji bédengiya wê re.

Bibûma teyrêkî Feqî, helbet min dê bask vekirana ji ava bi eşq û muhbet re û ji girava bi keser û fîgan re.

Min dê bigota, "Derwêşo! Dilê me weke teyrêkî ye. Wek teyrêkî Feqî ye... Bê bask firîne û bê bask mirin e yê me. me dinyaya rûşan e û di wê dinyayê de halê bextreşan e.

me ne can e û ne jî diêşe êdî, wek qerîna dayika'm weey li min....

me kaş e, kaşek e berepaş e... Zemanekî wek aş e... Zimanekî sade û hûr, ji agir dûr, li pey ava binê bîrekî kûr e. Evîneke ji dilê me hemûyan dûr e.

Dizanim Derwêşo, ji kilamên me, ji helbestên me, ji girîn û kena me, ji evîna me dixwazin kindirêkî birêsin ji bo sêdarekê. Wê demê kilam, helbest, ken û girîn û evîna ku wê kindirê sêdarekê birêsin bila heram be li me.

Wê demê helbest, evîn û teyrên Feqî bila ji me re bibin stargeh...


RIZO DIZO

Imam Cici



DOZO

Biracan



NAVENDA NEÇÊYAN A PÎNETOFÊ

Çol û çolistan, ber û beristan, dîsa rojek rojan (xwe bide alî ey Mazlûm Doğan) Mîrze Mihemed li mirovekî rast tê ku guhên xwe daniye ser qelşeke erdê û ji kirtê carekê dibêje "Hiii... hiii... hiii!" Mîrze Mihemed matmayî dimîne û li dû silavê dipirse: "Ev çi hawalê te ye qurban?" Guhdêr dibêje, "Heyran ev heft sal e ku derziya diya min ketiye nava vê qelşê û ev heft salê min e, ez guh didêrim. Hê jî şinge şinga wê ye, ber bi jêr ve diçe." Mîrze Mihemed li pey "Errrrrikî..." dirêj dibêje, "Wey malmemîrat! Ev bû çi?" Guhdêr dibêje, "Mala te mîrat nebe. Tu ji Mîrze Mihemed re nabêjî ku heft dawet bi hev re liandiye." Wê gavê Mîrze Mihemed pasaporta xwe ya sor nîşan dide û dibêje, "Welleh ez Mîrzê Mihemed im, lê ne bi ecêba tel!"

şikayetnamek ji me re bi rê kiriye. Dibêje: "Qurban ez ketim tor û bextê we! Hûn me ji destê "oqula wî aliyê avê (Marmara)" qurtarmîş kin. Ez li vî aliyê avê diçim oqulê û baciya min li wî alî. Lê dema ez dixwazim baciya xwe bibînim, Seta Çînê dikeve pêşiya min. Ji ber ku ji xeynî îîşkiyên îllegal, îîşkiyên di navbera oqulan de yasax e û

Dibêjin em ji destê lletîşim-Faq Fûq Fonê ketine nava agirê xwedê. Em êdî nawêrin, ji xwe re bi riyekê de herin û derkevin derveyî odên xwe. Fakulteya lletîşimê (ragihandin) tiştêk ji me re nehişt. Ne pênc quruş pere ne soleke rind û ne jî kincêkî pak. Mirov dikare bi sê telaqan sond bixwe û dev ji jina bi mehr berde, ku mamostên van pêxwasên Diyarbekirê ne û ne tu profesor. mironofesor in.



Merhaba ey canê canan merhabal
Merhaba ey eşqa dilan merhabal
Merhaba ey pîn pêrîşan merhabal
(Çênebû! Cardin bi meqamkî bixwînin û rêza dawîn dubare bikin.)
Di nivîsa xwe ya borî de me gotibû, "Me dil heye, em rengekî zanîngehî bidin Pîneyê. Li ser vê yekê em ketin nava xebatê û me hinek çavkanî peyda kirin. Ev van çavkaniyan pêşkêşî raya giştî dikin.



navê wê îîşkiyê jî datîne "îîşkiya yatay". Qurban hûn vê mektûbê xêra dê û bavê xwe bigihînin DMMWC'yê (em zanin hûn ji ve kurtenivîsê aciz bûn!.. Ev Dadgeha Mafên Mirovan ya Welatparêzên Ciwan e. Derbasî bel!..)

ZANÎNGEHA REEL SOSYALÏST Û MAOÏST (ZRSM)
Ji Zanîngeha Stenbolê xwendekarekî


Fakulteya Gasp û Talanê (lletîşim-Faq Fûq Fon)
Li aliyê din hemû fakulteyên Stenbolê bi ortaxî ji me re nameyek şandine.

ROJ JI ME XEYIDÎ...
Reş girêdaye seranserê welatê kurdan. Dibêjin, roj hatiye girtin li Kurdistanê. Dema ez zarok bûm, dayika min digot, "Kurê min! Beriya ku 'qiyamet' rabe, wê roj vemire. Lê kesên ku dabîn ser rîya rast û didin, ew dê bizanibin ku roj wê dîsa li wan bête der." Êreee!.. Ey roja delal, ey roja ronî, ey roja jîndar, ka bibêje, ma gunêhê me çi bû, ku tu ji me xeyidî îro! Dizanim! Em naletbarên gerdûnî ne û sê hezar sal e em di tarî û taristanê de ne. Lê, te ev rewş nepejirand. Te serî hilda li hemberî qedera kambax. Em nikarin lêborîne jî ji te bixwazin! Em nikarin...Ey roja torin (asil) ku tu li me neyê der, dar cardin aj nadin. Av naherike, teyr nafirin. Û careke din dinya napîşkive û dilê ciwan, bi ramanên bilind geş nabin. Ku tu li me neyê der, wê qiyamet li me rabe.

CIWAN Çekowar/ Nediyaaristan




* JI BO QONANS DIYARDEYA (colgo) DEM NÎNE. JI BO KU REXNE LI BÛYERÊN ÎRO BÊ GIKTIN, ME DA SER VÊ RÎNÊ...



Xeiîl Ziravav

GOTINA T.C. DIBE



MADAM KU ME
YÊ DERXISTAYA, WE ÇIMA
GOT BINAX BIKIN. ME EWQAS
XEBAT KIR. HEYF E.
JI XWEDÊ BITIRSINI..



Destên Ku Dê Ferhad Bikujin

Pencereya Peywê



EHMED HUSEYNÎ

Li wê bargeha dûr a ku bi mirina xewnan xemilandî bû, li ser kevîyên wê çolistanê spî ya ku bi kêra rengê xwe jena dilê min dikuşt, ango di navbera xêzên yekemîn ên berfa berbangê de, li wir, giyanê min di nivîna şevistanê de radîza, lêvên min di dastana şekirrêjîya serborên te de vedilîstin.

Hestên min ên ku xwe spartibûn tîrsa te, bi seqemê re dipeyîvîn, keftelefa qonaxê û nalîna revendê dengê te diristin, sibeha min a kelegirî bi poşmanî xatir ji çavê te dixwest û ber bi qiblenameya çîrokê ve sermîşîv dibû.

Qonaxa di navbera min û matmayîna gulên evîne de destên te yên ji beybûnan bûn; destên ku bêrkirin ji sûlavên wan dirijîya ey yara derengmayî!

Katjimêrên pêşîn ên sibeha wê sirûdê di velerizîna destmala bîranînên min de tar û mar dibûn û pêjnên rêwîyan wek efsaneya kirasê te xemgîn bûn; di şaneyên xewna min de semagerî dikirin ey yara ku ji ber rondikan mayî!

Gavên min di pirtûka pîrsê de wînda dibûn, maçên min hildiperikîn rojhîlata kenê te,

bi çîroka te diketim, bi dîloka te diketim

bi çimamoka ku li ser zimanê te bêhn vedida diketim û ji çîrokê têr nedibûm.

Giyanê min wek seqema vî welaîfî, bang bû, ber bi çel û hîmên hêviya te ve dibezîya, di gurîna sozên te de dişewitî, li ber xwe nediket, li ber te nediket.

Di ferhenga rewrewka te de, wişeyeke bi tena serê xwe bûm, min bîranînên xwe di hişê berbangê de dimeyand, min bi dizî gulava kenê te bi ser xwe û bi ser gazinên te de da dikir,

Da ku tiliyên te haş bikim, da ku giliyên te dawerivînim giliyên xwe û di zindana awirvedana te de dest bi nimêja karxezalan bikim.

Berfa ku hevrêtiya mirina min dikir wekî xwe bû, ji nijadeke serhişk û sersar bû. Min bi dûmana dilê xwe hevdiîta te li ser bergên berfê nîgar dikir û min mûmên xwe di laşê libendemanê de radiçikand.

Ji mûmên destên te neditirsîyam, lê li hemberî pîtanokên mit û mat ên lêvên te radestî herikîna çemê giryanê dibûm.

Dihatim te da ku li ber gula dengê te karwanên evînbazan biçemînim; gula ku rengên wê, êvariyeke, di xwîna min de teqîyan.

Min çîroka xwe ji berfê re digot, min westana rî û simbêlên xwe bi lezgavên rêwîyan dinixumandin, min kuştar û serjêkirinên xwe li bajarên belav dikirin û min mirina xwe li ser destê te bi cî dikir.

Berbangê min di çesnê bûkekê de bû, xatir ji hêlîna xwe, ji dergûşa temenê xwe dixwest û helkehelka qonaxê vedixwar.

Nêzikî gulgenimên tîndar ên zeviyên çavên te dibûm.

Nêzikî kurtepîsta surdar a laşê xwe û lixwemikurhatina memera gerdena te dibûm.

Nêzikî rakêşana çavên girêdayî û spîndarên sînga te ya mişt bîhok dibûm.

Nêzikî bêhna şevbuhêrkên dayîka xwe û gulhînara çîlmîsî ya daristana zarokatiya xwe dibûm.

Nêzikî kuçe û kolanên toza sermed û reşgirêdana esmanê Qamişloka şêrîn dibûm.

Nêzikî çîroka beravêtî û kevokên çavîrêmana Ferhad û mirina sorgulên çiya û hêlînen wêranbûyî yên dilê Zînê dibûm.

Nêzikî gulvedana helbesta zimanê te û dengvedana hilhatina rojê di eniya te de dibûm.

Wîsa, wek her gav, şevistan diherikî laşê min.

Birc û kelehên min têr nedikirin.

Raz û nehênîyên min têr nedikirin.

Tenê dê bi kuştina gulberoya destê min, destên te ber bi rojê ve bizivirin ey gulberoya birîne.

Hammedank!



Silav ji Pîneqolîkan re Berî her tiştî em xebatkarên Pîneyê ji dil û can pîroz dikin. Em dixwazin hinek gazinên xwe ji we re bînin zimên. Em ji nava rûpelên Pîneyê yên dawiyê ku beşa *remildankê* tê de ye ji nêzik ve dişopînin. Ewil ji bo ku me di wextê de guh neda şiyarkirina we, em lêborîna xwe ji we dixwazin. Lê, em sond dixwin ku ji niha û pê de êdî emê di rêça perspektîfên we de bimeşin. Ger hûn sedema vê dilsoziya me bipirsin, ji ber ku, me guh neda remila Mozê ya hejmara 6'an, cezayê "elektrîka qaçax" ji me re hat. Ji ber ku me guh neda we (baweriya we ji Xwedê hebe) me 120 milyon ceza xwar.

Îcar em heyran û qurban, de ka emê vî cezayî çawa bidin?

Em vê jî bidin xwiyakirin wê pir baş bibe. Yan na weleh bi Xwedê wê

bibêje bi Zazakî dinivîsîne, weleh ne rast e, çimkî ez bi Kirdkî baş dizanim.

Birêz Doğan, di Kovara Pîneyê de nivîs gelekî pir in û karîkatûr gelekî hindik in. Carina du karîkatûr rûpelekê tijî dikin. Weleh heram e. Heger daxwaza we hebe em jî dikarin ji we re karîkatûran bişînin. Pînetof û Kermêş gelekî baş in.

Bimire desthilatdariya nivîsan, bijî karîkatûr. Ez dixwazim bikenim, wek dînan bikenim. Ez naxwazim nivîsên we bixwînim û ji zimanê Kurdî bitirsim.

Pêşniyara min heye, ez dibêjim bila Qirix bikeve pêvajoya aştiyê. Hûn jî dizanin, Qirix di warê qerfê de xwedî roleke girîng e (bila zimanê wê Kurdî be).

Bijî wêne, bimire nivîs.

*Mevlût û Miçbim
Girtîgeba Passavê/Elmanya*

Merhaba ji we re Pînevanîno!

Di sêrî de, te Mazlûm, em nizanin te çî bikin? Tu li serê me bûyî bela. Malmîrat, yeka ku te anî serê me Roma Reş jî neanî. Di karê wan de, "him" tune ye "gimm" heye. Ew tê wateya kuştinê.

Te guh li me ker kir; "Name bişînin, name bişînin", ha ji te re name, zimanê te ji yê dapîra min jî dirêjtir e.

Qey dema me heye em nameyan bişînin. Em destê sibehê (hê ku dîka bang nedaye) şiyar dibin. Bawer bike em taştê jî naxwin. Deriyê qehwexaneyê em bi destê xwe vedikin. Kî ku di okeyê de bin dikeve diçe nan û penêr distîne. Şirîkê wî jî pereyê çayê dide.

Bi zorê em xwe digihînin qehwexaneyan din. Hevalên ku diçin qehwexaneyan tev welatparêz in, em ji wan re dibêjin, "Yurtsever Gençlik".

Îcar jî em kaxiz dilîzin, bi vî awayî em ji bo dewlemendkirina çand û hunerê ji dil û can dixebitin, li ser biryarên KNK'ê, li ser zimên jî em dişixulin, di nava xwe de Kurdî xeber didin. Em dibêjin, "Zaf çaba göstermiş keno, feqet ne başarmış keno".

Birayê Mazlûm, tu bawer bike Tatilyaya me jî tune. Em heya diwanzdehê şevê dimînin mesayiyê.

De tu yekî xerîb, destê xwe bide ser wijdana xwe ji me re bibêje; ka emê çawa Kurdî bixwînin, cihên qetiyayî pîne bikin û bi ser de nameyan bişînin ji we re?

Belê Mazlûm, çî serê te biêşînim, ev qerf û rexneyên me ne ji bo yên dixebitin in, divê her kes bibe xwediyê beşa xwe. Vê carê min halê me nivîsî, ku bi xweşiya te hat biweşîne. Ezê li ser mijarên din jî ji we re nameyan bişînim.

*Abûzer Coşkar
Amed*

Li gundê Lalanê (Aktepe) ku bi ser Elbistanê ye xwîşka Xanim diçe mala Îmam beg sewa hinek rûn bistîne. Dema nêzikî mala Îmam beg dibe, dibihîze ku li malbatê bi awayekî bilind axaftinek derbas dibe. Xwîşka Xanim guhê xwe nêzikî dêrî dike, lê tiştêkî fam nake.

Dayîk: Ma kuro te çî bû, tu ji xwarinê da ket, xav (xew) nakevî çavê te, yekî di ber xwe da tu navekî dibêjî, navekî... Belê, ev navê keça kê ye?

Law: Dayê, allê vale tiştêkî min tune ye.

Bav: De bêje ev navê arabeya ku tu bistîne an na?

Cîran: Guhê xwe nêzikê dêrî dike, lê navê keçê nabihîze (înşallah keça min e).

Dayîk: Te çî bû ji dayîka xwe re bêje, wele ez şîrê berê xwe....

Law: Ox, ox.... Kul, kederên dilê min; êş û janên canê min hûn bizanin, hûn wiha dey nakin.

Bav: Dê ji bavê xwe ra bêje, ez hem bavê te hem jî hevalê te me, dê bêje.

Law: Hiş bin, tiştê ku hûn dibêjin dînen Tirkan jî nabêjin.

Dayîk: Vişşş! Xwîşkê ev çî belayê hate serê min, kurê min dîn bûye.

Bav: Kuro, lavo, dîno, xwedî-meko, de bêje ev nêzikî mehek e tu nav xwe da li ser peyvêkê disekîne, ev peyv çî ye?


Dayîk: Dê bêje Pîne keça kê ye?

Cîran peyvê baş fêm nake, dibêje, belê, belê navê keça min got, navê Zekîne got. Dilê lavê malbata dewlemend beg li keça min e.

Law: Lo bavo, lê dayê, hûn nizanin, "ji kû bizanin".

Pîne kovara Kurdan e, qerfî û henekî ye, ne navê keça Ereban e. Ez Pîne fêm nakim, ji ber vê ez wiha me.

*Li ser navê Pîneqolîkên Elbistanê
Bayram Kartal*



dilê me ji hev bimîne. Û em vê jî rica dikin:

De ka niha haya we ji kontrola avê heye gelo, dê kengê dest pê dike. Qey nabe em xwe ji vê xelas bikin.

*Ji Zanîngeba Heranê li ser navê
komek nêçîrvanên kevoka aştiyê
Birban û Dilgeş
Ruba*

Roj baş xebatkarên Kovara Pîne!

Em silav û hurmet naşînin, ji ber ku dixwazin bi tenê rexneyan bişînin. Rexneyên min bila serê we bixwe.

Baş e bavê min, em dizanin Kurdiya we gelekî baş e, li dinyayê kesek jî wekî Helîm Yûsiv, Ehmed Huseynî bi Kurdî nizane. Baş e bavê min, dilê we rihet bû. Hûn her dem number one in, okey!

Xwedê mala we xera meke. Ma Kurd bila tiştêkî fêm nekin, yan jî we zaravayên nû derxistine haya me pê tune ye. Sivik bikin, sivik sivik... Qurbana mûyê pozê we.

Ez difikirim, birêz Haydar Işık bi zimanê Papua Nûgîneyê dinivîsîne, ji ber ku ez tiştêkî jê fêm nakim. Kî


Ji Qoserê silavên germ, Berî her tiştî ji bo xebateke wiha ez we pîroz dikim.

Hêvîdar im wê ev xebat bibe bê dawî.

Ez jî dixwazim li ser zimên çend gotinan bibêjim. Zimanekî zelal, zimanekî paqij hêviya me gişan e. Lêbelê, lazim e mirov di vî karî de ecele neke. Dem dirêj e û gerek e bêhna mirov jî fireh be. Lazim e nivîskar ji aliyê zimên ve pir nava xwe û gel xerab neke. Wexta mirov pir zêde têkeve pêşiya gel, wê gel şopa mirov winda bike û wê ji pey mirov vegere. A rast ew e, ku mirov vê sedemê bispêre demê û hêdî hêdî pê de rapelike. Bila dem tiryên tirş şêrî bike. Ji bo ku ya ku tiri şêrî dike dem e, ne germa zêde ye.

*Ettehiyato
Keçê Fato
Meqes veşêr
Xwedî bato*

*Loqman Qoçhan
Qoser*





Nûçeya Taybet û Secret

CAHÎD MERWAN XWE ŞEWITAND!

Denderleuw/KER-HA Rojnamevan, moderator, serok, nivîskar û kevnesiyasetmedar Cahîd Merwan birîndar e. Li gorî agahiyên ku nûçegihanê KER-HAYê bi dest xistiye, bûyer wiha qewimiye: "Cahîd Merwan, wekî her tim roja pencsemê, danê êvarê tevî mêvanên xwe yê li studyoyê dest bi Bernameya Sêla Sor kiriyê. Cahîd û mêvanên wî dest bi nîqaşên kûr û dûr û hûr kirine.

Wekî ku tê zanîn Merwan di rojên dawî de dekora bernameya xwe guhertiye, sêlek daniye studyoyê û li binê wê jî agir dadaye. Heta sêl sor dibe û di manqelê de arî namîne bername didome.

Di vê navberê de, rejîsor Xalê Osman, ji ber ku li odeya rejîyê xewa wî hatiye, xwestiye Cahîd bernameyê zû biqedîne, da ku karê wî jî bi dawî bibe. Ji bo vê yekê, bi riya mîkro-fona bi guhê wî ve jê re gotiye, "Tu dizanî, encamên anketa MEDYA TV'yê

eskere bûn. Bernameya ZOOM ji SÊLA SOR bêtir têtê temaşekirin."



Hawar e sayin seyircîler!

Piştî ku Xalê Osman, ev gotin ji Cahîd re gotiye, Cahîd ji nişkê ve zîz bûye û ketiye ser sêla xwe. Di encama bûyerê de, binê Cahîd di dereceya sêyemîn de şewitiye. Piştî vê yekê

mêvanên studyoyê û kameramanên wî, ew hilanîne nexweşxaneyê bajarê Aalstê. Cahîd, piştî mudaxaleya pêşîn, ji nûçegihanên Reuters, BBC û IPS'ê re gotiye: "Xwedê ez parastim! Baş bû ku pozê min neşewitî, yan na min ê çawa ev bername çê bikira! Ezê pozê xwe bidim sîgortekirin."

Li aliyê din, piştî bernameyê rêveberiya televîzyonê rejîsor Xalê Osman hildaye "ûyûlûmayê". Rêveberî niha dixwaze bizane ka tiliya Ermenistanê di vê komployê de heye, yan na? Her wiha ji ber ku Cahîd Merwan serokê wan e, Yekîtiya Rojnamevanan sê roj şîn girtiye. Lê, Selîm Ferat, ku pozberê Cahîd e, ev biryar nepejirandiye, lew re jî endamiya wî hatiye betalkirin. Partiya Sosyalîst jî, ji ber ku Cahîd endamê wan ê kevn e, sê rojan alên xwe heta nîvî daxistiye.

**Em dê kengê bibin meriv?
Kingê ku em hînî ferqa kurdî û tirkî bûn!..**

Mistdangeha Misto

Misto li salona xwe ya mistdanê di xizmeta we de ye!

Mistdanvanê bi diplome Misto, li her derê di xizmeta we de ye! Misto li hemû bajarên, li hemû deveran, li hemû saziyan, li ciyên ku berpîrs hebin, Misto nêzîkî we ye. Mistdana bi rûn, mistdana bê rûn, mistdana desthilatan, ya midir, berpîrsiyar û dewlemendan.

Mistdana binî, ya serî, hemû curên mistdanê!

**Ji midir û berpîrsiyarên qurre re erzanî!
Ji berpîrsên saziyên belengaz re bi teqîsdan!**

Mistdan huner e, slogana me, ya mizdan ya bazdan e!

Jêrenot: Misto endamê Partiya Mistdanvanan e (Par-Mist) û di mistdanê de basircahferoilê bi kar tîne. Wê der barê babetê Par-Mist û basircahferoilê de, di dema pêşiya me de agahî bêne ragîhandin.



BEQ Ên destê sibê hatine dinyê


Hevala delal! Kusurê nenêre, lê pêşeroja te baş naxuyê. Ji ber kuştina du mirîşkan, tuyê bikevî hepsê û hinî zimanê kurdî û hinî rexna û jiyana komînal bibî. Gava tu ji hepsê derkevî tuyê malbata xwe tawanbavê xwe re qirên bikî. Me di serî de got li kusurê nenêre.

QUŞXANE Ên berî nivro...



Hûn van roja hem zêde behsa azadî û aştiyê dikin û hem jî zêdeyî qumarê difîzin û dawiyê jî radibin bi qumarbazan re şer dikin. Hûn hem behsa biratî û wekhevîyê dikin û hem jî berjewendiyên xwe yê şexsî di serê her tiştî re digrin û dawiyê radibin bi birayê xwe re qirên dikin. Eger me tiştêk ji we fêhm kiribe em bibin kevir. Hûn bi kêfa xwe ne!..

MOZ Ên piştî dana pez




Tu li ser evîna xwe ketî gere-moleke vala. Ev çend meh in te tu biryar nestandiye. Hema bi Xwedê tu ji nizanî ka tu ji wê hez dikî an na. Malmîrat! Netirse û here jê re bêje "bi navê Xwedê û qewlê Ehmedê Xanî ez ji te hez dikim". Ma tu dizanî ku ew jî ev çend meh in li benda van peyvên e û çavên wê ji bo te bûne balafirgeh!..

CAŞIK Ên ber êvarê...




Xoşewîstê dilovan. Ji te re mizgîniyeke me heye, tu yê di rojên pêşiya me de bi keçeke bedew re bizewicî. Wê şazde heb kurên we çêbin û yek ji van kuran, wê rêxistinekê ava bike. Rêxistinê de di civakê de guhertinên mezin çêke û dî re ew civak wê bikeve nav Yekîtiya Ewropayê û tu yê bi wî kurê xwe ve pir dilşa bibî. (Em mizgîniya xwe dixwazin).

ZIRNE Ên nivê şevê...



Bi her sê telaqê bêfito, dilê me zêde bi we êşiya. Dua bikin "bilezik" ê we hene û hûn didin heqê kîra xaniyê xwe. Lê ka em çawa bikin qurban! Em rojname, kovar û pirtûkên kevn jî didin xwediyê xênî, qîma xwe nayne û her dem dibêje: Dolar dolar û dîsa dolar.

HUDHUK Ên heft mehî hatine...



Rojbaş birêz embazê hêja! Tiştê ku me bihîst ne xelet be, we li ser jiyana koçeran bi dest lêkolînên berfireh kiriyê û we dil heye derbarê wan de romaneke rêkûpêk binivîstin. Qet mereq nekin, ew pirtûka ku hûn difikirin dema were weşandin, wê zêde deng vedê û wê wergere 56 zimanan. Wê ew romana Koçeran, berî mirina we du sala, xelata Nobelê bistîne.

pîne

KOVARA PANZDEROJÎ (ONBEŞGÜNLÜK DERGİ)

- Xwedî (Imtiyaz Sahibi) M. Nuri KARAKOYUN
- Gerîhendeyê Giştî Mazlum DOĞAN
- Berpîrsiyarê Karê Nivîsaran
- (Yazî İşleri Müdürü) ABDURRAHMAN PEKEDİS
- Kargerê Giştî (Genel Müdür) SEYİT KARABAŞ
- Rûpelsazî A. RAHMAN ÇELİK
- Navnîşan (Yönetim Yeri) İstiklal Cad. Aylan İşık sokak. 19/1 Beyoğlu/ İSTANBUL
- Tel: (212) 292 72 70
- Fax: (212) 251 95 85
- E-Mail: pinedank@hotmail.com
- Kargerî (İdare) (212) 251 79 37
- Çapxane: YENİ ASYA Matbaacılık A. Ş.
- Yayın KOORDİNASYON Ses BASIN VE YAYINCILIK SAN. Tic. Ltd. Şti.
- Belavkirin BIRYAY DAĞITIM
- Nûnergeha Amedê Tel: (412) 223 34 83
- Swêd Tel: 46 86 52 34 29
- Swîsre Tel: 41 76 372 41 18

WELAT

Kongreya 7'an a Awarte pêk hat

PKK kete qonaxeke nû

Ji dîwê sînemageran raweşa sînemaya kurdî

Ji bo dizgariyê rola sînemayê pir mezin e

Her şemî li bayiya n e!

Bixwînin

"Komara Dînan alîkariya PKK'ê dike."

"Walîtiya Enqereyê, ku lîstika Teatra Jiyana Nû 'Komara Dînan' qedexe kir, got: 'Ev ne berhemeke hunerî ye. Ev kes, ji bo PKK'ya têkçûyî û binketî alîkariya maddî û manevî dîkin.'"

ÇİÇEK * CİCİ

HAL TE DÎT
VA YE YEKÎ DINJÎ
ALÎKARIYA PKK KIR
NA KURO!
WISA NAQE SERÎ

KÎ PERE
NEDE EZÊ
DL...

%100
KURDÎ

HEMÎR
10

KIR

